

Nûçe û Çalakî

Nûçe û Çalakî

CEJNA ÇARŞEMA SOR

Pertewê Şerqî

Wek diyar e, her cejne, piştî rizgariyekê , serkeftinekê , baweriyekê , guhartinekê, yan jî sersalekê tete holê . Ji ber wê li seranserî cîhanê ,cejnên têvel bi awayên curbecur, ji aliyê gelan ve li dar dikevin .

Lê tim û tim, bandor û hikariya cejnên Olî, bêtirî cejnên din, li hest û mejûyê mirovên olperest heye .

Ola Ezdahî jî, wek hemû olan, cejnên xwe di kûraniya dîrokê de, lenger kûr berdane û ji wan cejnan, Cejna Çarşema Sor e, ya ku dikeve Çarşema yekê ji Nîsana Rojhilat (Şerqî),û ew li ba Kurdên Ezdahî ,rojeke gelek pîroz tê jimartin .

Di roja çardehî Nîsanê de, Kurdên Ezdahî, karwane-karwane ji gund û bajaran derketin û berên xwe dan cihên pîroz, wek zareta Şêx Hemît - ya ku dikeve navbera gundê Qestelê û Baflûnê - , Çêlxane - li nêzîkî gundê Qîbarê û Tirindê , û li ber girê Endarê . Li van hersê cihan govend û awazên rengereng li dar ketin.

Îsal cejna Çarşema Sor û bi taybetî li ber girê Endarê pir balkêş bû. Ji ber ku, hilma Mîd û Mîtaniyan, bi asîmanê çiyayê Kurmênc de berdida. Li rex wê jî, keskesor,çiya û darên zeytûnê sed reng û bîn diyarî ahenga Çarşema Sor dikirin û bê dudilî hemû tiştên di hembêza sirûştê de, li ber awazên def û tembûran semayên, bê westan digerandin.

Bi vî awayî ji xweserê sinfonî li saz diketin û zelaliya Ezdahiyê û rastiya Çarşema Sor bêtir diyar dibûn .

Bê guman, cejna Çarşema Sor, cejna Kurdên Ezdahî ye , lê belê, gelek Kurdên ne Ezdahî jî, di vê cejnê de, beşdar dibin .. Îsal rola dengbêj û komikên foliklorî, ahengbi şeweyekî ciywaz bi dawî dikirin.

Lê tiştê hîn bêtir, ku ew aheng û şahî dewlemend dikirin, ew Qewl û sirûdên Ola Ezdahî, bi zimanê Kurdî, ji aliyê Şêxan ve dihatin pêşkêşkirin bûn.

Miha Nîsanê Hat Çarşema Sor li Kurdên Ezdahî bû xelat Şahî û pîrozî di demên keç û xortan de wek rojê hilat .

Cejna Çarşema Sor li Kurdên Ezdahî pîroz be.

Alfêbaya Kurdî- Latînî li Ermenistanê bû fermî

Di Yekîtiya Sovyet ya berê de, perwerde û nivîsandin di nav Kurdan , di xwendegehan de, ji sala 1941 an ve, tîpên Kirîlî bi kar dihatin. Piştî hilweşandina Sovyet, rewşenbîr, mamoste û muxtarên gundan, daxwaz û pirsgirêkên xwe ragihandin destlata Ermenistanê. Piştî danûstandinê bi destlata Ermenistanê re, ji nû ve pirtûk bi tîpên latînî hatin nivîsandin. Li gundê Elegezê, bi beşdariya mamoste, rewşenbîr, serokên xwendegehan û mixtarên gundan,serokê şewra gelê Kurd li Ermenistanê, Kinyasê Hemîd,ragihand ku: "*Bi alîkarî û piştgriya we, tîpên latînî li şûna tîpên kirîlî, ji hêla destlata Ermenistanê ve ,bi şewekî fermî hate pejirandin*".

Gelo: Kînga destlata Sûriyê jî , kanibeşopa destlata Ermenistanê bajo!?!...

Komîta şevbuhêrkan a Heleb bi boneya roja rojnemegeriyê**Rêzdariya nivîskarekî zimanê kurdî dike**

Li roja 22 î Nîsanê , komîta şevbuhêrkan a Heleb , bi beşdariya hejmarek ji zimanhez û çalakvanên zimanê kurdî , tabloyekê diyarî nivîskarekî kurdî dike . Di wê kurtehevdiştinê de , endamekî komîtê rola rojnamevanî û ragiyandinê di pêşvebirina miletan de , geşkirina rojnamegeriya Kurdî de diyar û ronî dike . Bi taybetî jî tîrêjan davêje ser ronakbîrê bi nav û deng – xwedanê yekemîn rojnameya kurdî ya ku , li 12î Nîsana sala 1898an li Qahîrê derhatî, Miqdad Midhet Bedirxan . Û weha ew pîrozbahiya bi şirovekirina vê mijarê ji aliyê tevan ve diqede .